Danasîna Pirtûkan

Berhevkirin: Gerok

Cegerxwîn
Zend-Avista- Dîwana 5'an
Şefaq- Dîwana 6'an. 340 rûpel

Helbestên helbestvanê navdar ê hevdem Cîgerxwîn, demekê ji ber qedexebûn û zordestiya li ser weşanên kurdî û bi taybetî jî yên bi zimanê kurdî, bi awayekî nehînî di bin destan re dihatin belav kirin. Tevlî qedexeyîya li ser wan jî, şîrên wî ji devê têkoşerên kurd nediketin.

Cîgerxwîn, di şîrên xwe de li ser tema netewî, çînî û civatî radiwestiya. Di vê pirtûka Cîgerxwîn de, dîwana 5-an ya bi navê "Zend-Avista" û ya 6-an ya bi navê "şefeq" hatiye çap kirin. Dîsa di pirtûkê de, pêşgotineke dûr û dirêj, ku meriv dikare jê re bêje alanîz a kurdologê bi navûdeng Qanatê Kurdo jî cîh digre. Qanatê Kurdo di vê analîza xwe ya ku nêzîkî 20 rûpelî digre de; bi awayekî kûr û berfireh li ser şîrên Cîgerxwîn radiweste û bi nimûneyên ji helbestên wî dîtinên xwe yên li ser şiêrên wî teyîd dike. Ev pirtûk di nav weşanên Deng de, derketiye.M. Emîn Bozarslan

Melayê Meşhûr. Pêkenok .
244 Rûpel

Melayê Meşhûr qehremanek mesela pêkenokan e. Ew mesele lî Kurdîstana Bakur diinava gelê kurd da tên gotin û bûne beşek jî edebiyata kurdî ya devkî. Li ser kesîtî û netewetiya Melayê Meşhûr zîmanên cure cure da gelek tişt hatîne gotin û gelek tişt jî li ser Melayê Meşhûr hatiye nîvîsandin. Her weha li gelek welatan li ser Melayê Meşhûr pir efsane hatîne afîrandin û ketîne dev zaran.

Brêz M. Emîn Bozarslan, li ser mesela Melayê Meşhûr lekolînek heja kiriye û li ser wî pirtûkek çap kiriye. Pirtûka M. Emîn Bozarslan li ser navê Melayê Meşhûr çapa pêşîn 1986an da li Swêdê hatibû weşandin. Çapa wê ya 2yan jî nuha ji aliyê Weşanxana Deng ve hatiye weşandin.

Pirtûka Melayê Meşhûr 248 rûpel e û di nav pirtûkê de 150 meselên Melayê Meşhûr hene. Nivîskar M. Emîn Bozarslan ji pirtûkê ra "Pêşkeşî"yeka dirêj nivîsiye û "Pêşkeşiyê" da pêkenokên Melayê Meşhûr ji hemî aliyan ve dane nasîn. Bozarslan ji bo zelalkirîna hin peyv û peyvikên pêşkeşiyê û pêkenokan, ferhengokek jî amade kiriye. Ew fe-